Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çileya Paşîn / 15 - 1 - 2022 Kurdistan-Hejmar (213) www.pdk-s.com

# Ji ber xerabiya rewşê, welatiyên Kurdistana Sûriyê bi qaçaxî diçin Herêma Kurdistanê

Kurdistan **Salar Xelîl**



Ji ber xerabiya rewşa ewlehî û aboriyê, pêleke din a koçberiya welatiyên Kurdistana Sûriyê ber bi Herêma Kurdistanê ve dest pê kiriye ku di heyama rojên derbasbûyî de nêzîkî 900 kes gihiştine kampa Berdereş li parêzgeha Duhokê. Welatiyek dibêje, ew ji ber kiryarên PYD û PKK û grûpên ser bi wan ve reviyane, ku rojane keç û ciwanan ji bo leşkeriyê direvînin û çarenivîsa gelek ji wan jî nediyar e. Welatiyek din dibêje, reva me hemî ji ber rewşa abûrî ye, ne nanekî baş heye, ne av heye, kelûpel hemû buha ne û nayên kirîn, mazot û benzîn buha ye, ev hemû sedem in ku dihêlin em ji nava xaka xwe birevin. Jinek jî dibêje, ew zarokên xwe ji ber zulma PKK û grûpên ser bi wê ve direvînin, û baştirîn cih jî ji bo wan Herêma Kurdistanê ye.

# Revandina zarokan berdewam e



Kurdistan-
Îmad Hesen

Di vê dema dawî de, ciwanên ser bi PKK ve hejmareke zarokên jêr 18 salî revandine û ew ji bo leşkeriyê birine ku piraniya wan keç in, û ev yek jî dengekî mezin li nava xelkê Kurdistana Sûriyê vedaye. Welatiyekî ji bajarê Qamişlo rêxistineke ser bi PKKê ve tometbar dike ku keça wî revandine û bang li Fermandarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî dike ku rêzê li îmzeya xwe ya li Cenêvê ya li ser rêkeftina qedexekirina leşkerkirina zarokan bigire. Welatiyê bi navê Fethella Gedo bangewaziyek belav kir û tê de ragihand, "Keça wî ya 16 salî Sema Fethella Gedo ji roja 192021/12/ê ve ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger a ser bi PKKê ve hatiye revandin." Fethella Gedo dide zanîn: "Keça min pola 11 dixwîne û nexweş e û li gorî rapora bijîjkan nexweşiyên (neurolojîk, psîkolojîk, depresyona giran, îzolasyon, atrofî û kurtbûna mezinbûnê) pê re hene." Bavê wê zarokê amaje bi wê jî da, "Di çend rojên borî de sozên vegerandina keça min bo malê ji hin xizm û hevalên min re hatibûn dayîn, lê heta niha ew soz nehatine cîbicîkirin." Fethella Gedo di bangewaziya xwe de bang li rêxistinên navdewletî yên yasayî û mirovî, kesên girîngiyê didin mafên zarok û dayikan, partiyên siyasî yên Kurdî kar ji bo vegerandina keça wî bo malê bikin, ta ku keça wî çareseriyên bijîşkî werbigire. Herwiha Fethella Gedo dibêje: "Ez bi taybetî bang li Fermandarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî dikim ku rêzê li îmzeya xwe ya li Cenêvê ya li ser rêkeftina qedexekirina leşkerkirina zarokên di bin 18 saliyê re bigire." Bavê zarokê tekez dike: "HSD û Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) bi tevahî di ber ewlekariya zaroka min û xerabûna tenduristiya wê ji niha û pê de berpirsyar in."
Fethella Gedo di bangewaziya xwe de dibêje: "Ez bang li hemû kesên ku bi pirsên niştimanî û mirovî re pêwendîdar in dikim ku kar ji bo rawestandina diyardeya revandina zarok ji aliyê Ciwanên Şoreşger û hemû aliyên din ên leşkerî ve bikin." Ji aliyekî din ve, Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê di raportekê de belav kir, li bajarê Qamişlo grûpeke ji Tevgera Ciwanên Şoreşger roja 192021/12/ê keça 16 salî Sema Fethella Gedo dema diçû navenda "Hanza" ya perwerdehiyê revandin û armanc ji revandinê ew e, wê tevlî nava hêzên YPJê bikin. Tevî ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) di Hezîrana 2019an de bi Neteweyên Yekbûyî re planek ji bo bidawîkirin û qedexekirina leşkerkirina zarokan îmze kiribû. Lê ji dema ku peyman hatiye îmzekirin ve, rewşa revandina zarokan bi dawî nebûye. Herwiha piştî zêdetir ji 20 rojan ew keç hate azadkirin. Li ser revandina zarokên temenê wan di jêr 18 salan de rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan wergirt. Mihemed Ehmed derbarê vê mijarê de wiha dibêje, PKK bi rêya alîgirên xwe dixwaze rewşa Kurdistana Sûriyê têk bide, û ev kiryarên têne kirin ji aliyê ciwanên ku navên xwe kirine ciwanên şoreşger bi mebest têne kirin û armanc jê jî tirskirina xelkê ye herwiha derencam koçberkirina wan e ji deverên wan û ev yek jî niha tê kirin û xelk pereyan li xwe dide û bi qaçaxî berê xwe dide Herêma Kurdistanê, xelk ji tirsa re keç û xortên xwe ji ber destê vê rêxistinê direvînin û ev mafekî rewa yê xelkê ye ku naxwazin zarokên wan bibin qurbaniyên destê PKK.Welatiyek din dibêje, heger hat û ev kiryar berdewam bin dê rewşa Kurdistana Sûriyê berev xerabiyê ve biçe, û dê xelk hemû koçber bibin, ev yek jî di demekê de ye ku rewşa vê xelkê gelekî xerab e û rewşa abûrî xerab e û xelk di rewşeke zehmet de derbasb dibin.



# Li Efrînê dar têne birîn û samanên Kurdan têne dizîn

Kurdistan-
Ekrem Şêxo

Komên çekdarên opozîsyona Sûriyê yên li Efrîn, ji bilî dizîna berhemên zeyt û zeytûnan, darên zeytûnan jî dibirin û wek êzing difiroşin.
Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê di raporteke de belav kir, hîn jî proseya birîna daran û bi taybet darên zeytûnan li herêma Efrînê ji aliyê komên çekdar ên ser bi Tirkiyê bi awayekî sîstematîk berdewam e.
Rêxistina Mafên Mirovan dibêje, tevî ku cotkar û gundî giliyan li aliyên pêwendîdar tomar dikin, lê heta niha ti rênimayeke yasayî nehatiye girtin û proseya birîna daran ji aliyê çekdaran ve berdewam e. Wê rêxsitinê diyar kir, di van çend rojên borî de, 170 dar li gundê Meydankê, 70 dar li gundê Elbîskê, 60 dar li gundê Qêsim, 150 dar li gundê Coqê û 24 dar li gundê Kefir Zîtê hatine birîn. Rêxistina Mafên Mirovan diyar kir jî, ti stûnên eliktirîkê yên darîn li deşta gundên Marat, Xelnêr û Kefir Şîlê nemane, ku hemû ji aliyê dizên koma Hemzat ve û li ber çavên artêşa Tirkiyê hatine birîn û dizîn. Destnîşan kir jî, di salên 20192020-'an de jî kabloyên elektrîkê yên wê deştê ji aliyê çekdaran ve hatibûn dizîn. Ji dema dagîrkirina Efrînê di 18ê Adara 2018an de, artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ve, ji bilî ku destê xwe danîne ser bi hezaran darên zeytûnan, bi sedhezaran darên xelkê jî, hilkirine, birîne û şewitandine.
Arif Hemdo li ser vê mijarê wiha dibêje, divê ev kiryar werin rawestandin û êdî xelkê me ji kiryarên grûpên çekdar rizgar bibin û jiyaneke xweş derbas bikin, divê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS banga vê xelkê bighînin aliyê Tikriyê ku rê li ber van grûpan bigre, û êdî saman û dar û rezê Kurdên Efrînê talan nekin, lewma divê di zûtirîn dem karên xwe himbiz bike û wê komîteya ku hatibû damezirandin ji bo vegera mafê xelkê bê aktîvkirin, û sînorek ji van kityaran re were danîn. Cemal Şêxo jî wiha li ser vê mijarê dibêje, birîna darên zeytûnan tawaneke mezin e ku derheqê gelê me yê Kurd li Efrînê tê kirin û divê ev tawan were rawestandin, grûpên çekdar heta niha ti rêgirî ji ti aliyekî nedîtine ji ber vê yekê ew di tawanên xwe de berdewam in bêyî ku hesaba ti aliyekî bikin. Ev mijar gihiştiye ber destê hemû aliyan û hemû alî jî dizanin ku ev tawan li Efrînê têne encamdan lê bêdengî hilbijartine û diyar e ev yek bi dest û dilê wan tê kirin. Pêwîste Neteweyên Yekgirtî di vê derbarê de bi erkê xwe rabe û sînorekî ji kiryarên grûpên çekdar re deyne ji ber ku bi rastî nema têne tehemulkirin. Berî niha Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bi daxuyaniyekê ragihand: "ENKS kiryarên hovane yên li Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê dibin bi tundî şermezar dike û daxwazê ji Tirkiye û welatên pêwendîdar bi dosya Sûriyê û rêxistinên mirovî û yasayî dike, bi berpirsiyariyên xwe yên exlaqî û yasayî rabin û sînoreke ji van kiryarên ku digihin asta tawanên şer deynin." Bi hinceta avakirina xalên leşkerî, vekirina riyan, avakirina komlegehên nişticihbûnê, grûpên çekdaran zêdetir ji 625 hezar darên zeytûnan birîne û zêdetir ji 700 hezar darên hiracî birîne û şewitandine.
Cano jî dibêje, gelo kî van tawanan qebûl dike, xelkê me yê li Efrînê ketine nava du agiran de, û nema dizanin çi bikin, grûpên çekdar ji aliyekî li Şehba û Helebê jî çekdarên Partiya yekîtiya Demokratîk PYD dev ji wan bernade û ciwanan direvîne.








# Şêx Ehmed Barzanî xwedanê hizra niştîmanperweriyê

Kudistan-Bidûvçûn

Yek ji mezintirîn zana, hilgirê hizra mirovatiyê, niştimanperwer û jîngehparêz li Kurdistanê, Şêx Ehmed Barzanî ye. Şêx Ehmed Barzanî sala 1896 li devera Barzanî di malbateke Kurdperwer û navdar de ji dayik bû. Piştî şehîdbûna birayê wî yê mezin Şêx Ebdulselam Barzanî, Şêx Ehmed cihê wî girt û berdewamî da tevgera Barzan û xebata mirovatî û şoreşgerî û di serdema wî de çaksaziya civakî hate kirin. Şêx Ehmed Barzanî di rojeke wek îro, di 11ê Çileya 1969an de koça dawiyê kir.





Şêx Ehmed Barzanî piştî şehîdbûna birayê wî yê mezin Şêx Ebdulselam Barzanî, rêbertiya tevgera Barzanî dikeve ser milê wî, ew dem jî hevdem e bi destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem re ku di encama vî şerê cîhanî de, ligel wan şert û mercên giran ên di ser tevegera Barzan de derbas bûne re, navçeya Rojhilata Navîn bi giştî û Kurdistan bi taybetî ketin ber guhartinên mezin, bi taybet di rûyê ciyografiya siyasî de.
Kurd û Kurdistan di encama van guhartinan de, zerermendên sereke bûn, ew jî bi sedema perçebûna Kurdistanê ji du perçeyan li ser çar perçeyan, her wiha zext û zordariyên ku li ser tevger û şoreşên gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê hatine meşandin, ji wan jî Şoreşa Şêx Seîdê Pîran û Şoreşa Agirî li Bakurê Kurdistanê, Şoreşa Şêx Mehmûd Hefîd li Başûrê Kurdistanê û Şoreşa Simkoyê Şikak li Rojhilatê Kurdistanê.
Di van şert û mercan de devera Barzan bi rêbertiya Şêx Ehmed Barzanî, bû cihê omêd û hêviya gelê Kurdistanê. Tevî vê rewşa ne xweş a ku tevgera Barzan bi xwe jî ketibûyê ji encama şehîdbûna Şêx Ebdulselam Barzanî û zulm û zora dijminan li Kurd û Kurdistanê, lê Barzan di heman demê de bû hêviya alîkarî û starkirina şoreşgeran û lêqewimiyên tevahiya pêkhateyên olî û netewî. Rola ruhanî ya Şêx Ehmed Barzanî, bû navendeke bihêz a îlhambexşê bo şoreşgerên Barzan û Şoreşa Îlona Mezin bi rêbertiya Mela Mistefa Barzanî, ev jî bû sedem ku Barzan herdem bibe keştiya hawarê ya tevgera siyasî û netewî ya Kurd di dirêjahiya qonaxên dîrokê yên dijwar de, ew jî vedigere bo rêbaza rewiştbilind, lêborîn, yeksanxwaziya tevgera Barzan di piştgiriya xelkê hejar û stemlêkirî û heqantiya wê rêbazê ji bo bidestxistina mafên mexdûran û penageheke aram ji hemû ji tevahiya netewe û olan re.
Ev rêbaz, bû bingeha xebata rêbertiyê di warên siyasî, civakî û çandî de ji bo doza Kurdî ya îro, di heman demê de wek ezmûneke çalak û dewlemend di îdarekirin û birêvebirina Herêma Kurdistanê de, li ser destê Rêberê gelê Kurd yê îro Serok Mesûd Barzanî ku berdewamiya vê rêbazê ye û hêvî û omêda gelê Kurdistanê ji bo gihîştina qeraxa aramiyê ye.

# Rewşa Zimanê Kurdî li Kurdistana Tirkiyê

Kurdistan

Li Bakurê Kurdistanê perwerdehiya bi zimanê Kurdî bi taybet jî di her werzên perwerdehiyê de dikeve rojevê. Mafê dersên bijarde yên bi Kurdî hebe jî, gelek astengî û kêşe hene ku perwerdehiya zimanê Kurdî biserkeftî birêve biçe. Saziyên Ziman jî bangewaziyên xwe dikin ku malbatên Kurd berê zarokên xwe bidin dersên Kurdî yên bijarde. Piştî ku di 3ê Rêbendanê de pêvajoya bijartina Dersa Bijare ya Zimanê Kurdî dest pê kir partiyên siyasî û saziyên sivîl bi awayekî bênavber banga xwedîlêderketina zimanê Kurdî dikin ku dê pêvajoya bijartina Dersa Bijare ya Zimanê Kurdî 21ê Rêbendanê de bi dawî .bibe
Platforma Ciwanên Kurd bi boneya kampanyaya hilbijartina dersên Kurdî li dibistanên Bakurê Kurdistanê daxuyaniyek belav kir û di wê daxuyaniyê de bang li malbatên Kurd kir ku dersên Kurdî ji bo zarokên xwe hilbijêrin. Daxuyaniya Platforma Ciwanên Kurd wiha ye: Wek tê zanîn di polên 5, 6, 7 û 8an da mafê dersa bijarte ya Kurdî heye. Pêwîst e malbat serî li saziyên pêwendîdar bidin da ku zarokên wan li dibistanan dersên zimanê Kurdî bibînin. Em dizanin ku zext û asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî bi serîlêdana bi dersa bijarte bi dawî nabe. Ya rast ew e ku zarokên Kurd li dibistanan bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibînin. Lêbelê, di statûko de şikestinek herî biçûk jî divê em girîng bibînin. Ev pêngava biçûk bi tekoşînek netewî dikare bibe deskeftinek mezintir. Heta ku me ji dewleta Tirkiyê mafê xwe yê perwerdeya bi zimanê zikmakî û zimanê Kurdî bi fermî bidin qebûlkirinê divê em serî li dersa bijarte ya Kurdî bidin. Bi vî awayî him zarokên Kurd ji zimanê xwe dûr nakevin him jî mamosteyên ku dersên Kurdî didin di tayînkirina wan de em dibin alîkar. Weke Platforma Ciwanên Kurd, banga me li malbatên kurd ev e; bo zarokên xwe daxwaza dersa bijarte ya Kurdî bikin. Em bang li her kesî dikin ku di vê mijarê de .hestiyartir bin

